



Bezirksverordnetenversammlung
Friedrichshain-Kreuzberg von Berlin Der
Vorsteher



BVV Friedrichshain-Kreuzberg, Yorckstr. 4-11, 10965 Berlin

Herr Heck Vorsteher

Dienstgebäude:
Yorckstrasse 4-11, 10965 Berlin
Telefon Durchwahl (030) 90 298-3204
werner.heck@ba-fk.berlin.de
Datum: 13. November 2023

Birêz hevşaredar Bêrîvan Hesên,
Birêz hevşaredar Cîwan Ehmed,

Meclîsa Encumenan a Navçeya Friedrichshain-Kreuzbergê di civîna xwe di 18.10.2023ê de encamnameyekê di derbarê „şermezarkirina êrîşên ji nû ve yên li dijî binesaziya sîvîl li herêma bajarê me yê dost Dêrikê“ (DS/0911/VI) derxist, ku ez dixwazim di derbarê vê yekê we agahdar bikim. Wergera Encamnameyê ya bi riya Komeleya Dostaniya Bajaran pêk hatiye ev e:

„Encamname DS/0911/VI

Mijar.: Vermezarkirina êrîşên ji nû ve yên li dijî binesaziya sîvîl li herêma bajarê me yê dost Dêrika li Bakurê Sûriyeyê

1. Meclîsa Encumenan a Navçeya (BVV) Friedrichshain-Kreuzberg êrîşên li dijî mafên gelan ên li dijî mirovên sîvîl û binesaziya sîvîl ên li bajarê me yê dost Dêrikê ya li bakurê Sûriyeyê şermezar dike.

Em li hemberî rûxandina bi giştî ya Nexweşxaneyê Covid-19 a bi riya balafirên şer ên dewleta Tirk radibin, ku ev nexweşxane her wisa ji aliyê Nexweşxaneyê Mobîl ve dihat bikaranîn, ku ev yek ji aliyê Komeleya Dostaniya Bajaran û Weqfa Jina Azad WJASê dihat birêvebirin.

Bi riya ruxandina ji nû ve ya santrala karebayê ya ku di mijdara 2022an de carekê de bi giştî dîsa hatibû ruxandin û bi awayekî awarte ji nû ve hatibû avakirin, xizmeta bingehîn a av û karebayê ya bajar û gundewarên Dêrikê qut bûye û tenê bi riya



Bezirksverordnetenversammlung
Friedrichshain-Kreuzberg von Berlin Der
Vorsteher

jeneratorên mazotê ev xizmet dikare bi awayekî berdewam be, k ubi riya bexşên ji aliyê Komeleya Dostaniya Bajaran ve piştî êrîşên di 202an de hatibû sazkin.

Em xebatkarên ewlekariyê yên di 9ê Cotmehê bi riya bombebaran li devê Bajarê Dêrikê hatine qetilkirin bi bîr tin û di kesayeta wan de em tevahiya birîndaran bi bîr tînin. Bi xebata xwe ya li seytereyan, wan bajarê me yê dost ji êrîşên terorîstên DAIŞê diparast.

2. BVV bi berdewama ji bo baştirkirina jiyana li bajar û gundewarên Dêrikê tédikioşe û piştgiriye xebata Komeleya Dostaniya Bajaran a Friedrichshain-Kreuzberg – Dêrikê.

3. Şaredarî rica dike, ku bi riya nemeyekê an em ji hevşaredarên Dêrikê re ragihînin, ku şaredariya me û meclîsa encûmenan ji ber xemgîniya wan li gel wan e û piştgirî û hevgirtina xwe bi bajarê me yê dost re nîşan dide. Şaredarî hatiye peywirdarkirin, ku ew vê biryarnameyê ji Wezaretê Karê Derve re bişîne. „

Li gel silavên germ